Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :743 15-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Pisporên xwerek pêşniyar dikin ku giyayên biharê bibin xwarinên sereke

*Pisporên xwerek pêşniyar li welatiyan dikin ku giyayên biharê bibin xwarinên sereke û gotin; "Divê welatî giyayên biharê kom bikin û berî ku hişk bibin bi kar bînin."*



Li Kurdistanê bi hatina biharê re bi sedan nifşên giya û pincarê şîn dibin. Li gorî agahiyên ji Saziya Riwek a Kurdistanê hatin girtin, piştî Çînê di warê pincar û giya de welatê herî dewlemend Kurdistan e. Ser sê hezar nifşî re giyayên cuda li Kurdistanê hene. Hinek ji wan ji aliyê welatiyan ve tên xwarin. Herwiha bi hatina biharê re bazar tejî giyayên xwezayî dibe û xwesteka welatiyan li ser zêde ye.

Di demsala biharê de, tolik, kereng, rêvaz, karî, mend, sîrik û hwd şîn dibin.

Li gorî pisporê xwerek Mihemed Faruq, ji bo tenduristiyê faydeya van giyayên xwezayî gelek heye. Lewre rêjeyek zêde av, hesin, proteîn, mîneral û vîtamînan dihevîne ku her yekê faydeyê wê ji bo tenduristiyê heye. Wek mînak, hesin ji bo hevsengiya xwê û başkirina bêhntengiyê baş e.

Mihemed Faruq wiha qala faydeya giyayên xwezayî kir, "Rêvaz çavkaniyek baş a vîtamîna D ye. Piraniya giyayên xwezayî yên tên xwarin, madeya dijî toksîn tê de hene. Ji bo parastina laş baş in. Ji bo tinekirina hucreyên penceşêrê dibin alîkar. Yek ji girîngtirîn sûdê giyayên biharê ew e ku qet madeyên kîmyawî di wan de nîne. Gelek girîng e ku welatî giyayên xwezayî bixwin, bi taybetî nîvro û êvaran."

# Şaredariya Mergeda sererastkirina du pirên ku 100 gundî bi hev ve girê didin bi dawî kir



Şaredariya Gel a bajarokê Mergeda yê kantona Hesekê sererastkirina du pirên li aliyê rojhilat û başûr rojhilatê navçeyê ku 100 gundî bi hev ve girê didin, bi dawî kir. Şaredarî amadekariya projeyên zimetgûzarî yên nû dike.

Bajarokê Mergeda yê li başûrê navçeya Şedadê ya girêdayî kantona Hesekê dawiya sala 2017`an ji aliyê QSD'ê ve hat rizgarkirin. Rêveberiya Xweser ji bo peydakirina pêdiviyên jiyanî û bi taybetî yên xizmetgûzarî, kar kir. Şaredariya Gel bermayiyên ji ber şerê çeteyên DAIŞ`ê û şerê li herêmê rakirin û bi awayekî berbiçav jiyan li bajarok vegerand.

Herwiha piştî rakirina bermayiyên şer bi hevkariya Meclisa Navçeya Şedadê dest bi sererastkirina cihên giştî li navçeyê kir ku çeteyên DAIŞ`ê ji xwe kiribûn baregeh.

Şaredariya Gel a bajarokê Mergeda sererastkirina 2 pirên di navbera gundê Qiye Sircîn û El-Selce yên 20 km li rojhilat û başûr rojhilatê bajarok in, bi dawî kir.

Her du pir zêdeyî 100 gundên li ser riya Dêrazor û Hesekê bi bajarok ve girê didin.

# Li Fafîn û Zirganê hemleya 'Bi paqijiyê jiyan geş dibe' dest pê kir



Şaredariya Gel a Efrînê bi durişma "Bi paqijiyê jiyan geş dibe" dest bi hemleya paqijkirina kolanên navçeya Fafînê kir.

Roja Pêncşemê bi dehan endam û rêveberên Şaredariya Gel, meclisa navçeya Fafînê, bi durişma "Bi paqijiyê jiyan geş dibe" dest bi paqijkirina kolanan kirin.

Şaredariya gel alav û pêwîstiyên ji bo paqijkirina kolanan mîna traktor û stêrên avê peyda kirin.

Hemleya paqijkirinê wê li gundewarên navçeya Fafînê tevan ji aliyê Komîteya Xizmetgûzariyê ya komînan ve berdewam bike.

Li Zirganê jî hemleya paqijiyê dest pê kir.

Şêniyên herêmê, endamên şaredariya gel û saziyên sivîl ên navçeya Dirbêsiyê berê xwe dan navçeya Zirganê da tevlî hemleya paqijiyê bibin. Hevseroka Şaredariya Gel a Zirganê Nofa Ebîd spasiya Şaredariya Dirbêsiyê kir ku destek da wan, bi wan re tev li hemleya paqijiyê bû û wiha axivî: "Emê bajarê xwe li hemberî şerê çeteyên dewleta Tirk paqij bikin. Emê parastina bajarê xwe û paqijiya wê bikin. Em ji êrîşan natirsin û em bi moraleke pir bilind li ber xwe didin."

# Diri El-Cenûb bû şampyona turnuvaya Şehîd Semîr

Tîma Diri El-Cenûb (Mertalê Başûr) piştî ku li hemaberî tîma Diri El-Cezîre bi ser ket, bû şampyona turnuvaya futbolê ya Şehîd Semîr.

Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê li navçeya Til Hemîsê bi tevlîbûna 10 tîman turnuvaya futbolê bi navê "Şehîd Semîr" li dar xist. Maç li gundê Texlib ê 32 km li başûrê navçeyê hatin lîstin



Tîmên beşdarî turnuveyê bûyîn ev in; Texlib, Diri El-Cenûb, Diri Sincar, Diri Şemer, El-Zurqa, Sefane, Umiye, El-Selmase, Nisûr Umeye û Ebû Cirî.


Turnuvayê nîvê meha Sibatê dest pê kir û bi lîstika dawî ya di navbera tîma Diri El-Cenûb û Diri El-Cezîrê de bi dawî bû. Di encamê de tîma Diri El-Cenbû bi ser ket û bû şampyona turnuvaya futbolê ya Şehîd Semîr.

Şervanê Hêzên Erka Xweparastinê şehîd Semîr 14`ê Tîrmeha 2019`an li ser sînorên Sûriyê û Iraqê li ser erkê xwe şehîd bû.

# Adar hat bihar hat

Bi hatina meha Adarê re xwezayê bi rengê xwe mizgîniya biharê da welatiyan. Pelên daran bişkivîn û kulîlk vebûn.

Bi hatina meha Adarê û zêdebûna germê re xweza geş bû. Li Gundên beriya Qoserê bi hatina Adarê re xweza kesk bû. Pelên daran bişkivîn û kulîlk vebûn. Bi geşbûna xwezayê û vekirina pel û kulîlkên daran xweza rengîn bû. Kulilkên darên behîv û darên din mizgîniya biharê didin welatiyan.



# Bi 7 gavan parastina ji Korona

Ji bo xweparastina ji nexweşiyên vegir û vîrûsa Koronayê, em îro jî grafîkekê bi we re parve dikin. Bi vê grafîkê şîretên besît ên ku bijîşk ji bo parastina şexsî ya ji nexweşiyên vegir û nexasim Koronayê pêşnîyaz dikin, em bi Kurdî bi we xwînerên xwe re parve dikin.




# Erdogan ji Rûsyayê destvala vegeriya



***Dawiya sala borî*** û destpêka vê salê, gelek bûyerên girîng li Sûriyê qewimîn. Ji aliyekî ve Trump vekişandina hêzên Emerîkayê ji bakurê Sûriyê ragihand. Wê jî rê ji Tirkiyê re vekir ku bajarê Serêkaniyê û Girê Spî dagîr bike. Ji aliyekî din ve Rûsya û Tirkiyê li bajarê Idlibê li hemberî hev sekinîn.***R-5***

# Hevdîtin nayê wateya ku tecrîd bi dawî bûye



Ezîz Elî anî ziman ku dewleta Tirk di aloziyeke mezin re derbas dibe û dema di pêvajoyeke wiha re derbas dibe, dihêle hevdîtin bi rêber Abdullah Ocalan re çêbe, ji ber ku baş dizane ku hêza çareseriyê li cem Ocalan e. ***R-4***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 743 15-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li bakurê Kurdistanê Newroz Hat Betalkirin

Hat diyarkirin ku Cejna Newrozê ya bi girseyî dihat pîrozkirin, ji ber koronavîrûsê hatiye betalkirin. ***R-2***





# Kooperatîf wesîleyek ji bo birêxistinkirina jinan û xurtkirina rola wan a aborî ye

Kooperatîfên çandiniyê yên taybet bi jinan li bajarên herêma Cizîrê hewl didin bi jinan re eleqedar bin da ku rola wan ji aliyê aborî ve xurt bikin û rola jinan di geşepêdana aborî de bi hêz bikin. ***R-3***



# Xwendekar bi perwerdeyê bersiva dagîrkeran didin

Dewleta Tirk a dagîrker di êrîşa xwe ya ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybetî bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî de, dibistan û navedên perwerdê bombebaran kirin. Di encamê de, bi hezaran zarok ji dibistanên xwe dûr ketin. ***R-6***



# 'Gava distrêm derd û xemên xwe ji bîr dikim'

Dengbêj Aliyê Bîngolî ku ji 10 saliya xwe ve distrê, dibêje: "Gava kilaman dibêjim rihet dibim, kêliyekê be jî derd û xemên xwe ji bîr dikim." ***R-7***

# Serhildana Qamişlo, Çirûska Bihara Gelan e

**Tevî girtin û zordariya rejima Sûriyê, 2004an bi sedhezaran Kurd ji bajarê Qmişlo heta paytexta Sûriyê Şamê rabûn serhildanê. Ew serhildan bû çirûska yekê ya bihara gelan û bingehê destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê-Bakurê Sûriyê.** ***R-5***



# Xwedîderketina li erkan dilsoziya bi Rêbertiyê re ye

Şêniyên Efrîn û Şehbayê li dijî tecrîda li ser Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan rabûn ser piyan. Şêniyên Herêma Efrîn teqez kirin ku; hevdîtin tenê têrê nake. Heta ku rêberê me azad nebe wê Tirkiyê her di nava kirîzan de be.

**Idrîs Henan**

Pêwîst e gelên Sûriyê yekîtiya xwe çêkin

Endama Meclîsa Kampa Serdem a penaberên Efrînê li Şehbayê, Leyla Îbrahîm, di vê derbarê de ji rojnameya me re axivî û ev tişt anî ziman: "Dahûrandinên rêbertiyê bi giranî civakî û rexneyên li ser şêwazê birêvebirina saziyan bûn. Careke din rêbertiya me teqez dike ku baweriya xwe heta dawiyê bi têkoşîna gel heye. Dîsa jî hişyarî daye ku pêwîst e gelên Sûriyê bi yekîtiya xwe hêza xwe çêkin. Ancax bi riya hêzê em xwe ji firtûneya Rojhilata Navî xilas bikin".

Li Hemberî rêbertiyê em rexnedayîn didin

Leyla Îbrahîm di nava gotinên xwe de behsa hêza ku rêbertî qalê dike kir û wiha domand: "Lazim e em xwe ji hinek xisletên takekes û ezeziyê xilas bikin. Bi ruhekî kolektîv nêzî kar û xebatê bibin ku bikarin hêza xwe ya berxwedanê ava bikin. Ferd ji bo komê û kom jî ji bo kes bixebitin. Bi vî rengî jî sazîbûna xwe ava bikin. Ji dijmin pirtir li hemberî şaşîtiyan têkoşînê bikin û kêmayiyên heyî jî sererast bikin".

Endama Meclîsa Kampa Serdem Leyla Îbrahîm di dawiyê de jî behsa rola jin û ciwanan di vê têkoşînê de kir û wiha got: "Em wek jin û ciwan li hemberî rêbertiya xwe rexnedayîn didin. Pêwîst e jin hîn zêde rêxistinbûna xwe ava bike. Ji bo me jin û ciwanên Efrînê moralek bû ku tempoya kar û xebatê wê hê bilinditr bike".

Gotinên serokatiyê cihê moral û hêzê ne

Dayîka bi navê Îlfet Elî Berko jî ku şêniya Kampa Serdem û endama komîteya lihevanîna civakî ye, di vê derbarê de ev tişt got: "Her gotineke serokatiyê ji bo me cihê moral û hêzê ye. Ji bo serxistina têkoşînê, her peyvek rêbertiyê watedar û perspektîv e".

Dayîka Îlfet wiha dewam kir: "Weke ku rêbertiya me gotiye pêwîst e her kesê ku rêxistinbûn û sazîbûna vê şoreşê xira dike, hesab jê were xwestin. Derveyî serxistina berxwedana gelan û şkandina tecrîda li ser rêbertiya me ti armancên me nînin. Kesê ku van nirxan binpê bike, pêwîst e berteref bibe".





Şkandina tecrîdê erkekî exlaqî ye

Dayîka Îlfet di nava gotinên xwe de teqez kir ku rêbertiyê xeta têkoşîna wan sererast kiriye û ji nû ve pêşengiya jin û ciwanan wek şert destnîşan kiriye. Îlfet wiha bi dawî kir: "Jêdera hêza me Rêber APO ye. Erkekî me yê exlaqî ye ku em rêbertiya xwe tenê nehêlin. Civakeke kor, bê hêz, bê pî û hatibû ber keviya qirkirinê bi saya Rêber APO zindî bûye. Ji lew re em çiqas bikin jî emê her deyndarê berxwedana rêbertiya xwe bin. xwedîderketina li erkan dilsoziya bi rêbertiyê re ye".

## Li bakurê Kurdistanê Newroz Hat Betalkirin

Hat diyarkirin ku Cejna Newrozê ya bi girseyî dihat pîrozkirin, ji ber koronavîrûsê hatiye betalkirin.

Partî û pêkhateyên di Xebata Tifaqa Kurdistanî de cih digirin, diyar kirin ku Cejna Newrozê ji ber koronavîrusê hatiye betalkirin.

Nûnerên KCD, TJA, DBP, HDP, Partiya Azadî, DDKD, PÎA, KKP, KDP-Bakur derbarê Cejna Newrozê ya di 21'ê Adarê de li avayiya KCD'ê ya li Amedê daxuyanî dan.

Di daxuyaniyê de hat diyakirin ku Cejna Newrozê ya bi girseyî dihat pîrozkirin, ji ber koronavîrûsê hatiye betalkirin.

Di daxuyaniya ji bo Newrozê de wiha hat gotin:

"Çawa ku tê zanîn 11'ê Adara 2020'an me daxuyaniyeke hevpar dabû û diyar kiribû ku me ji bo Cejna Newrozê ya bi coş û heybet xebata xwe ya amadekariyê daye destpêkirin. Lê ji ber koronavîrûsê ya li hemberî mirovayiyê bûyî gefeke mezin, em bi partiyên siyasî û rêxistinên civakî yên sivîl re, du roj in nîqaşan dikin.

Piştî nîqaşan derket holê ku li Tirkiyeyê jî vîrûsa koronayê hatiye dîtin û li gorî me tendirustiya gelan ser her tiştî re ye. Ji ber wê me biryar da ku wê betalkirina pîrozbayiyên Cejna Newrozê gelek girîng be.



Em ji gelê xwe û ji civaka navneteweyî re radigihînin ku çalakiyên girseyî yên Cejna Newroza 2020'an hatine betalkirin."

## Partiya Pêşerojê ya Sûriyê amadekariya kongreya giştî dike

Rayedarekî Partiya Pêşerojê ya Sûriyê piştrast kir ku wan 26 kongre ji navçeyên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re li dar xistine û amaje bi nêzîkbûna lidarxistina kongreya giştî ya partiyê kir.

Partiya Pêşerojê ya Sûriyê li navçeyên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kongreyên xwe li dar xistin, niha jî amadekariyên lidarxistina kongreya giştî dike.

Têkildarî girîngiya lidarxistina kongreyan, serokê Nivîsgeha Giştî ya partiyê Elî Himêdî ji ANHA'yê re axivî.

Himêdî di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser ku Partiya Pêşerojê ya Sûriyê destpêkê bi armanca belavkirina bername, fikrên partiyê û armanca partiyê, birêxistinkirina partiyê tenê komîteyên xwe li gund, bajaran û navçeyan ava dikirin.

Têkildarî girîngiya lidarxistina kongreyan Himêdî got: "Bi nêzîkbûna dema lidarxistina kongreya giştî ya partiyê û hîn zêdetir xwe di nava gel de bidin naskirin, diviyabû li ser esasê mekanîzmaya rêxistinî gel bihata birêxistinkirin. Li ser vî esasî me kongreyên navçeyan li dar xistin û meclisên partiyê li navçeyan ava kirin, bi vî rengî dê di vê pêvajoya hesas de yekitiya gel mîsoger bibe."

Himêdî diyar kir ku Partiya Pêşerojê ya Sûriyê li navçeya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê anku li herêmên wekî Cizîr, Firat, Efrîn û Şehbayê 26 kongre li dar xistin. Di heman demê de partî hîn jî kongreyên bi armanca amadekariyên lidarixistina kongreyên şaxên parêzgehan dike û dê kongreya giştî jî li dar bixe.

Der barê nirxandina partiyê ji kongreyên hatine lidarixstin de Himêdî got kongre li gorî plansaziyan bi rê ve çûn, serokên meclisên navçeyê û cîgirên wan, endamên meclisa partiyê li navçeyan, endamên kongreyên şaxan hatin hilbijartin.

Elî Himêdî di dawiya axaftina xwe anî ziman ku dê di pêvajoyê bê de kongreyên şaxan werin lidarxistin, di kongreyên şaxan de dê serokatiya meclisa parêzgehê, cîgir, endamên meclisa parêzgehê, komîteyên disîplîn û endamên kongreya giştî werin hilbijartin.

Tê zanîn ku Partiya Pêşerojê ya Sûriyê li bajarê Reqayê di 27'ê Adara 2019`an de bi slogan "Ber bi Sûriyeke nenavendî, pirreng û demokratîk ve" hate ragihandin û li ser vî esasî meclisa giştî ya partiyê ji 81 endam, sekreterê giştî û serokê partiyê hatin diyarkirin.



## Şêniyên Helebê ji bo bîranîna şehîdên 12`ê Adarê mûm vêxist

Kombûna Çandî ya Heleb serhildana 12`ê Adarê û şehîdên wê bi vêxistina mûm û danîna daxuyaniyekê bibîr anîn.

Kombûnê di daxuyaniyê de teqez kir ku çareseriya aloziya Sûriyê bi çareserkirina doza Kurd ve girêdayî ye.

Ji bo bîranîna şehîdên serhildana 12`ê Adarê, kombûna Çandî ya Heleb çalakiyek lidar xist. Bi dehan endamên kombûnê tev li çalakiyê bûn. Çalakî li herêma El-Cibênat li taxa Şêxmeqsûd lidar ket.

Hevserokê Kombûna Çandî ya Helebê Leyla Xalid daxuyanî xwend.

Daxuyanî wiha ye:



Îro salvegera 16`an a serhildana 12`ê Adarê ye. Ji beriya 16 salan yanî di 2004`an de li bajarê Qamişlo destpê kiriye û heya tevahiya herêmên Kurd li Sûriyê belav bû. Ev serhildan tovika yekemîn a şoreşa Sûriyê bû. Hinek kesan hewl dan armancên serhildanê bilîzin, fîtne û tovên parçebûnê di navbera gelê Sûriyê de biçînin.

Bi navê Kombûna Çandî ya Helebê em bejna xwe li ber tevahiya şehîdên serhildanê ditewînin. Em berxwedana girtiyên ku destanên berxwedanê xêz kirin silav dikin.

Bi rêya vê boneyê em dixwazin bêjin, em hêvî dikin ku hemû sûd ji aloziyê girtibin. Her wiha em hêvî dikin ku aloziya welatê me Sûriyê û azarên gelê Sûriyê bi rêya tunekirina tevahiya cureyên tundiyê û dagirkeriyê, bidawî bibin. her koçber û paneberek vegere warên xwe û ewlehî tê de serwer be.



# 'Gava distrêm derd û xemên xwe ji bîr dikim'

Dengbêj Aliyê Bîngolî ku ji 10 saliya xwe ve distrê, dibêje: "Gava kilaman dibêjim rihet dibim, kêliyekê be jî derd û xemên xwe ji bîr dikim."

Li Çewligê dengbêj Alî Dolgûn ê 70 salî, ji 10 saliya xwe heya niha distrê. Li bajêr wekî Dengbêj Aliyê Bingolî tê naskirin. Bingolî, Şakiro jî di nav de gelek dengbêj nas kirine. Bingolî ku kilama Bişarê Çeto, Kewê û Şerê Selanîkê distrê, ji ber ku li bajêr maleke dengbêjan tuneye kilamên xwe li qehwexaneyan dibêje.

### DI NAV DENGBÊJAN DE MEZIN BÛYE

Bîngolî, diyar dike ku gava biçûk bûye Şakiro, dengbj Husênê Ordûnosê, dengbêj Sidîqê Kanîreşê nas kiriye û bandoreke mezin ji wan girtiye. Bîngolî, destnîşan dike ku nifşên nû qîmeta dengbêjiyê û kilamên dengbêjiyê nizanin û dibêje: "Ên niha bêtir stranên û hunermendên modren guhdar dikin. Kêm kes dengbêjan guhdar dike. Zarokên min bi xwe jî stranên cuda guhdar dikin. Heger em qîmetê nedin dengbêjiyê, wê winda bibe. Berê em gund bi gund digeriyan û me kilam digotin. Gundî giş li dor me kom dibûn. Bi saetan em distriyan. Lê tiştek jî wê çandê nema. Em diçûn dawetan, li wir me ji bo bûk û zavê kilam digotin. Lê her diçe qîmeta dengbêjiyê kêm dibe. Carinan şevên dengbêjan tên lidarxistin, gazî me jî dikin. Lê bihêvî me ku wê dengbêjî bibe wekî berê. Çimkî tiştên li ber tunebûnê bin xwedîqîmet in. Ez dibêm wê bi vî awayî qîmeta dengbêjiyê jî zêde bibe. Heta em sax bin em bistrên."

Bîngolî, tîne ziman ku mîna behrê ne û dibêje: "Tu çi qasî bsitrê jî naqedin. Ji xeynî kilamên xwe kilamên dengbêjin bi nav û deng jî dibêjim. Gava distrêm rihet dibim. Kêliyekê be jî derd û xemên xwe ji bîr dikim. Dengbêjî kilamên evîniyê, mirin, koçberî, lehengî, wêrekî, keserî û xemgîniyê dibêjin. Dengbêjî wekî marketekê ne. Her kilam tê de hene. Usûlek wê heye. Divê em kilamên xwe li gor derûniya civakê bibêjin. Her kilamek xwedî wateyekê ye û tu dikarî li ser kilamekê pirtûkan binivîsî."

### 'GAVA DISTRIYAM DIREHILÎM'

Bîngolî, diyar dike ku Dengbêj Şakiro di sala 1978'an de hatiye mala wan û du rojan maye û ji bo wê rojê dibêje: "Gava Şakiro bû mêvanê me ez ciwan bûm. Min kilam digotin. Şakiro jî ji bo dawetekê hatibû Çewligê. Du rojan li mala me ma. Êvarekê maliyên me ji Şakiro re gotin ev jî distrê. Şakiro jî xwest ez kilamekê bêjim. Min kilamek got, lê li ber Şakiro direhilîm. Tiştekî ecêb bû. Nedihat bîra min ku



ez ê li cem dengbêjekî ev qas biheybet bistrêm. Ew roj tiştekîe cêb bû. Çimkî karibî bistrê jî li gava tu li ber Şakiro bî, tu yê ji bîr bikî. An jî tu yê newêribî bistrê."

### 'ŞAKIRO BEHREK BÛ'

Bîngolî, bilêv dike ku Şakiro tenê ne dengbêj bûye û dibêje: "Bi qasî dengê xwe ew qasî jî xweşsohbet bû. Di warê ilm, çand û civakê de jî bi saetan diaxivî. Gava diaxvî mirovan nedixwest bsitrê dixwest biaxive. Behsa dîrokî û tiştên qewimîbûn dikir. Şakiro tenê ne dengbêj bû. Deryayek bû ku Xwedê dabû me. Nahmetek bû. Di sohbetekê de yek ji Şakiro dipirse, dibêje 'Gava tu distrêyî tu dibê qey diqelişe û gurînî bi ezmanan dikeve. Carinan jî tu pir hêdî distrê, çima?" Şakiro dibêje, 'Kilam çi qas miqam û deng be divê ew qas nexş û reng be jî.'"

***MA***





## Cihên nîşandana fîlmê 'Ji bo azadiyê'

Fîlmê "Ji bo azadiyê" (The End Will Be Spectacular) qala berxwedana Sûrê ya 100 rojî dike. Cihên ku fîlm lê bên weşandin hatin eşkerekirin.

Fîlmê ji aliyê Komûna Fîlman a Rojava ve hatî çêkirin û Ersîn Çelîk derhêneriya wê kirî, di navbera 6-15'ê Adarê de tevlî bernameya Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Cenevreyê bû, ku yek ji festîvalên sereke yên bi mijara mafên mirovan e.

Cihên ku fîlmê 'Ji bo azadiyê' Adar, Nîsan û Gulanê lê bê nîşandan wiha ne:

Bajarê Elmanya Koln, Hamburg, Hannove, Attendorn, Kîel, Stûttgart, Salzgîtter, Koblenz, Dresden, Leîpzîg, Chemnîtz, Erfûrt, Berlîn, Dûsseldurf, Mûnchen, Magdeburg, Oldengburg, Regensburg, Dortmund û paytext Berlîn.

## Hunermend Mihemed Şêxo li Qamişlo hat bîranîn

***Bi pêşengiya Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê û Yekîtiya Rewşenbîran ya Cizîrê hunermend Mihemed Şêxo, di salvegera wefata xwe ya 31ê de hat bîranîn.***

Hola navendê bi wêneyên hunermend Mihemed Şêxo hat xemilandin. Bi sedan ji heskiriyên hunermendê nemir, malbatên hunermend Mihemed Şêxo, bi dehan hunermend û nivîskar tevî endamên navend û saziyên sivîl yên bajêr di merasîmê de amade bûn.

Di merasime de piştî rêzgirtinê bi navê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê Ednan Îbrahîm û hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Xerîb Hiso axivîn. Axaftvanan bixêrhatina beşdaran kir û diyar kirin ku



hunermendê nemir Mihemed Şêxo her tim li hemberî zilm û dagîrkeriyê bi stiranên xwe li ber xwe daye û êşa gelê Kurd rave kir."

Axaftvanan got, mirov bi riya hunera Kurdî dikare bibe dengê demokrasî û azadiyê lê divê helwesteke ku armanca wê yekîtiya Kurdan e were nîşandan.

Birayê hunermend Mihemed Şêxo, Hecî Hemîd jî wiha got: "Mihemed Şêxo bi stiranên xwe wisa kir ku em li hev kom bibin. Her stiraneke wî rojnameyeke siyasî bû. yê jê hes dikir ji stiranên wî fêm dikir."

Di dawiya merasîmê de Koma Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya stiranan, gelek stranên Mihemed Şêxo gotin. Herwiha sînevizyoneke girêdyaî jiyan û hunera hunermendê nemir hat nîşandan.

## Ji bo çareserkirina pirsgirêkan komîteyek hat avakirin

**Dilîn EHMED/Ronahî Qamişlo**

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakê, rewşenbîrên Herêma Cizîrê komîteyek ava kirin.

Cara yekê ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî, li Qamişlo 13ê Adarê komîteya amadekar a bi navê Ronakbîrên Rojava hat avakirin.

Çawa ku tê zanîn di her civakê de rola rewşenbîran girîng e. Di vê çarçoveyê de komek nivîskar û rewşenbîrên Herêma Cizîrê, piştî du civînên berfireh avakirina komîteyekê pêwîst dîtin.

Di kongreya çapemeniyê de bi daxuyaniyekê komîte hat ragihandin û bang li tevayiya Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê hat kirin ku li erkê xwe yê rewşenbîriyê xwedî derkevin.

**DAXUYANÎ WIHA YE.**

Bi mebesta afirandina hişyarî û raperîneke çandî ku rewşenbîr beşdarî çareserkirina pirsgirêkên civakî bibin, em vê gavê davêjin. Herwiha ji bo helwest û rawestana li hemberî êrîş û metirsiyên li ser hebûna gelê me, wek komîte me biryar da ku em erkê xwe yê exalqî û welatparzî pêk bînin.

Endama Komîteya Rêveber a KNK Ebîr Esaf, li ser vê komîteyê ji rojnameya me re axivî. Ebîr Esaf wiha got: "Di vê demê de pêwîstya gelê Kurd bi avakirina komîteyeke bi vî rengî hebû. Lewre rewşenbîr di civakê de xwedî rol in û hêviya me ew e ku pirsgirêkên civakê bi hizir û ramanên xwe çareser bikin. Her gaveke bi vî rengî ku armanca wê çareserkirin be, wê encamin baş ji bo civakê bi xwe re bîne. Kî dibe bila bibe, ya girîng ew e ku, pirsgirêkên civakê werin çareserkirin.



Gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê gelek zor û zehmetî kişandine û ketiye nava xetera bişaftinê. Lê bi berxwedanê kariye xwe û çanda xwe biparêze. Ji bo parastina van destkeftiyan, avakirina komîteyên bi vî rengî gavên pîroz in. Ji bo karê wan em serkeftinê dixwazin.

# Xwendekar bi perwerdeyê bersiva dagîrkeran didin

Dewleta Tirk a dagîrker di êrîşa xwe ya ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybetî bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî de, dibistan û navedên perwerdê bombebaran kirin. Di encamê de, bi hezaran zarok ji dibistanên xwe dûr ketin.



**Dilîn EHMED/Ronahî Qamişlo**

Dewleta Tirk, di êrîşa 9`ê Cotmeha 2019an a ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, bi taybetî Serê Kaniyê û Girê Spî, jin û zarok kirin hedef. Herwiha saziyên zanistî û xizmetgûzariyê jî bombebaran kirin. Di encamê de zarok jî ji mafê xwe yê herî xwezayî ku perwerde ye, bêpar man. Zarokên koçberan li gorî cihên lê bi cih dibin, ji dibistanekê diçin dibistaneke din. Ev jî bandorê li perwerdeyê dike.

Ji ber êrîşan li bajarê Serê Kaniyê 23 hezar û 360 xwendekar ji perwerdê dûr ketin. Ji bo xwedîderketina li van xwendekaran û domandina perwerdeyê Rêveberiya Xweser û Heyva Sor a Kurdî li Kampa Waşokanî dibistanek ava kirin.

Ew dibistan li gorî sê beşan -seretayî, navî û amadeyî- hatiye amadekirin û 73 mamoste hatine diyarkirin. Saziyên xwecihî, xwendekarên Efrînê, gel û Heyva Sor a Kurdî, ji bo xwendekaran alavên dibistanê bi cî kirin.

### WÊ BI ZANISTÊ PAŞROJA XWE RONÎ BIKIN

Ji Rêveberiya Komîteya Perwerdê a Kampa Waşokanî Mihemed Hacî, li ser rewşa perwerdê a li kampê, ji rojnameya me re axivî. Mihemed Hacî wiha got: "Li ber çavê cîhanê tevê, dewleta Tirk êrîşî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Di encamê de bi hezaran malbat ji warê xwe koçber bûn. Ev bû sedema dûrketina zarokan ji dibistanên xwe. Hem dûr ketin, hem koçberiyê bandor li derûniya wan kir. Ji bo xwedîderketina li wan, wek komîteya perwerdeyê, bi avakirina kampê re me dest bi perwerdeyê kir. Bi derfetên





heyî, em bi xwendekaran re dibin alîkar. Destpêkê jimara xwendekarên her sê beşan 1150 bû. Lê jimar roj bi roj zêde bû heta gihîşt 1700 xwndekarî." Mihemd axaftina xwe wiha qedand: "Ji ber ku jimara xwendekaran zêde ye (1700) û konên dibistanê kêm in, (17) em zehmetiyê dikişînin. Ji bo wê em mecbûr dibin saetên perwerdeyê kêm bikin. Niha her beşeke xwendekaran rojê sê seatan perwerdeyê dibîne."

Mamoste Maya Etiya jî li ser heman mijarê wiha axivî: "Tevî rewşa zehmet a xwendekar tê re derbas bûyîn, xwesteka wan a perwredeyê pir e. Em jî kêfxweş dibin ku xwendekar ji bo perwerdeya xwe van êrîşan asteng nabînin. Çawa ku tê zanîn, di nava civakê de rola mamosteyan girîng e, bi taybetî di rewşên şer de. Lê divê mamoste jî baş bizanin ka çawa û bi çi rêbazî nêzî xwendekaran bibin. Di dawiyê de vê dibêjim; wek mamoste heta ji me were emê nehêlin zarok ji perwerdeyê qut bibin û tişta ji me were xwestin emê bikin."

### JI BO ŞKANDINA DAGÎRKERIYÊ EMÊ ZANISTÊ PÊŞ BIXIN

Xwendekarê refa şeşan Wîsam Mihemed jî, li ser perwerdeyê wiha axivî: "Tevî ku em ji dibistan û bajarên xwe dûr ketine, xwesteka me ya fêrbûnê ti carî kêm nebûye. Ez bi mamosteyên xwe kêfxweş im û ji dibistana xwe jî pir hes dikim. Ji bo hevalên xwe yên ji perwerdeyê dûr ketîn jî vê dibêjim; werin bi me re fêr bibin, tiştek ji zanistê xweştir nîne. Em hêvîdar in berî gavekê vegerin bajarê xwe, çimkî min pir bîriya kolanên wî kiriye."

## Şêniyên Hesekê aloziya avê çawa derbas kirin û çareseriyên rêveberiyê çi ne?



Şêniyên Hesekê bi desteka Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, aloziya qutbûna avê ku dewleta Tirk ya dagîrker sedema wê bû, derbas kir. Rêveberî jî ji bo dîtina alternatîfan ji bo rewşên bi vê rengî, di nava hewldanê de ye.

Artêşa Tirk ya dagîrker 25`ê Sibatê ve av ji îstasyona Elûk (10 km li rojhilatê navçeya Serê Kaniyê) ya girêdayî kantona Hesekê, qut kir. Ji ber wê ser 700 hezarî re welatiyên Sûriyê bê av man û aloziyeke mezin derket. Piştî destwerdana Rûsyayê alozî bi dawî bû.

Îstasyona Elûk ya avê çavkaniya sereke ye ku avê dide bajarê Hesekê û navçeyên wê yên başûr. Îstasyon 30 bîrên ku sala 2013`an ketine xizmetê, bi kar tîne.

Hevseroka Gerînendetiya Avê ya Kantona Hesekê Sozdar Ehmed, ji ajansa nûçeyan Hawar re sedemên qutbûna avê diyar kirin û wiha got: "Artêşa Tirk ya dagîrker û çeteyên yên bi navê Artêşa Nîştimanî ya Sûriyê piştî ku xebatkar derxistin û îstasyon sekinand, ava vexwarinê li ser bajarê Hesekê qut bû."

Yek ji serçeteyên Artêşa Niştîmanî ya Sûriyê 25`ê Sibata borî ji rojnameya Zeman re diyar kir ku wan û artêşa Tirk herikîna ava vexwarinê ji îstasyona Elûk qut kirin.

QSD`ê ji bo çareseriyeke demkî bi sehrîcan (tanker) av li şêniyan belav kir û bîrên din yên bajêr ketin xizmetê.

Rêveberiya Xweser ji 25 Sibatê ve av ji şêniyên re peyda kir û bi sehrîcan av ji deverên wekî Til Berak, Til Hemîs û Hima dianîn û dida şêniyan.

Têkildarî mekanîzmeya belavkirina avê hevserokê Komîteya Şaredariyan û Parastina Jîngehê ya kantona Hesekê Abdulxefûr Oso diyar kir ku şaredariyên bajêr bi riya komînan û serhrîcên avê bêpere li şêniyan belav dikin û got, tevî ku îstasyona Elûk niha dixebite jî, em li taxên bajêr bîrên avê zêde dikin, herwiha emê torên avê ji çavkaniyên xwezayî yên din ava bikin.

## Yekîtiya Werzişê ya Herêma Firatê hat avakirin

Ji bo pêşxistina werzişê, Desteya Ciwanan û Werzişê Yekîtiya Werzişê ya Herêma Firatê û meclisên werzirşê yên kantona Kobanê û kantona Girê Spî ya dagîrkirî, ava kirin.

Avakirina Yekitiya Werzişê ya herêma Firatê û meclisên werzişê yên kantona Kobanê û Girê Spî, piştî ji hevketina yekîtiya werzîşê ya kantona Kobanê pêk hat.

Avakirina yekîtiyê bi daxuyaniyekê hat ragihandin. Hevserokatiya Desteya Ciwan û Werzişê ya Herêma Firatê Bozan Berkel û Dilê Berkel daxuyanî li yarîgeha Hevaltiya Nerwêc û Kobanê (1), bi zimanê erebî û



kurdî daxuyanî xwendin.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: Wek Desteya Ciwan û Werzişê ya herêma Firatê, 10`ê Adara 2020`an em avakirina Dezgeha Yekîtiya Werzişê ya herêma Firatê û meclisên werzişê yên kantona Kobanê û Girê Spî, radigihînin.

## Koçbera ji Idlibê: Weqfa Jina Azad piştgira rastî ya jinên Sûriyê ye

Koçbera ji Idlibê Mervet Umer Dekuş berê xwe da Weqfa Jina Azad. Weqfê jî daxwaziya wê pêk anî û derfeteke kar jê re peyda kir. Mervet bang li tevayiya jinan dike ku serdana Weqfa Jinan a Sûriyê bikin û got, lewre piştgira rastî ya jinan li Sûriyê ye.

FacebookTwitterWhatsAppTelegram

Weqfa Jina Azad ya Sûriyê, her tim hewl dide destkeftiyên pirtir bi dest bixe. Jinên li Sûriyê ji zincîrên kevneşop yên civakî û ji şerê bi sedhezaran sivîl bûyîn qurban, xilas bike.

Bi destpêkirina çirûska şoreşê re, li seranserê Sûriyê xwepêşandan belav bûn. Bajarê Idlibê yê li bakurê Sûriyê jî yek ji ciyê xwepêşandanan bû. Piştre di navbera rejima Sûriyê û komên çekdar de şer dest pê kir. Herî zêde sivîlan ji vî şerî zerer dît û bi hezaran koçber bûn.

Mervet Umer Dekuş (31) ji şêniyên herêma Cisir Şixur ya li bakurê Idlibê ye. Ji ber şer tevî malbata xwe bi riya Heyva Sor a Sûriyê ber bi bajarê Qamişlo ve koçber bû.

Mervet li ser koçberiya xwe ji ANHA'yê re axivî û got: "Berî şer jiyana me hinekî baş bû. Di 10 saliya xwe de ji dayîka xwe fêrî dirûnê bûm û min alîkariya malbatê kir.

Mervet diyar kir li Idlibê ji ber çeteyan û komên çekdar rewşa jinan ne baş bû û got, "Ji bo pêwîstiyên xwe yên rojane jî jinan nikarî derkevin derve. Em sala 2015'an bi riya hinek komeleyan û Heyva Sor a Sûriyê ji Idlibê derketin û hatin bajarê Qamişlo. Qamişlo herêma herî ewle ye. Me xaniyek li taxa Hîlaliye kirê kir. Pişt re ji bo kar min serî li weqfa jinan da. Wan jî ji min re karê dirûnê peyda kir."

Mervet herî dawî got, "Piştî min dest bi kar kir, rewşa min a derûnî hat guhertin û got, hêvî dikim jinên li kar digerin, serdana Weqfa Jina Azad a Sûriyê bikin, lewre ew piştgira rastî ya jinên Sûriyê ye.





# Kooperatîf wesîleyek ji bo birêxistinkirina jinan û xurtkirina rola wan a aborî ye

Kooperatîfên çandiniyê yên taybet bi jinan li bajarên herêma Cizîrê hewl didin bi jinan re eleqedar bin da ku rola wan ji aliyê aborî ve xurt bikin û rola jinan di geşepêdana aborî de bi hêz bikin.

Kooperatîf li Bakur û Rojhilatê Sûriyê roleke girîng di pêşxistina aboriya herêmê û afirandina karê komî yê hevgirtî di navbera endamên civakê de dilîzin. Her wiha armanc dikin ku derfetên kar û jêdarên qûta malbatan peyda bikin.

Komîteya Aboriya Jinan a Kongreya Star kooperatîfên çandiniyê yên jin li herêma Cizîrê dişopîne. Kongre girîngiyê dide jinên ku derfetên wan sînordar in da ku tev li koopratîfê bibin. Bi armanca ku desteka wan bikin û derfetên kar ji wan re peyda bikin, tevî ku wan bi rêxistin bikin.

Li herêma Cizîrê 16 kooperatîfên çandiniyê yên taybet ên jinan hene. Tê de 409 jin şirîk in, di wan kooperatîfan de genim, ceh û baqûlî têne çandin.

Li herêma Dêrikê rûbera zeviyên ku tê de kooperatîf hatine çêkirin, 580 hezar donim e bi tevlêbûna 147 jinan. Li navçeya Tirbespiyê kooperatîf li hezar û 500 donim bi tevlibûna 30 jinan hatin avakirin. Li herêma Girkê Legê rûbera zeviyên ku kooperatîf tê de hatine vekirin 6 hezar donim in bi tevlibûna 76 jinan. Li navçeya Amûde 210 donim di kooperatîfekê de bi tevlibûna 10 jinan hatin çandin. Li kantona Hesekê qada ku di 7 kooperafîtan de bi tevlibûna 146 jinan hate çandin gihaşt derdora 10 hezar doniman.

Li navçeya Serêkaniyê ya ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê dagir kir, 42 hezar donim di 4 kooperatîfan de bi tevlêbûna 150 jinan hatibûn çandin.



Di çarçoveya kooperatîfên çandiniyê de yên ku Komîteya Aborî ya Kongreya Star endama rêveber a Kooperatîfa Çandiniyê ya bajarokê Tobez ê girêdayî navçeya Amûdê Mehe Zoro got komîte ji wan re zeviyên gundê Ciwarde pêşkêş kirin. Tê de 10 jin şirîk in; du jin ji malbatên şehîdan, 3 ji malbatên ku qûta wan sînordar e û 5 jinên bêkes in.

Mehe wiha domand: "Komîteya



Jinan semad û derman ji jinan re pêkêş kirin da ku zeviyek bi rûbera 375 doniman biçînin. Zevî bi genim, ceh û baqûlî hatin çandin. Piştî berhevkirina hilberînê komîteyê tovên ku pêşkêş kirine vegerandin û qezenca kooperatîfê hate parvekirin." Girêdayî armanca kooperatîfan Mehe got: "Armanc vedîtina hilberînek çandiniyê ya hevkar dûrî tekekesiyê ye. bi şêwazekê ku xizmeta berjewendiya jinan dike. giyana hevkariyê û jiyana hevpar di navbera jinan de belav bike. Alîkariya madî bi rêya kooperatîfan ji jinan re pêşkêş bike."

## Li Reqayê panela "Jin bihara civakê ye"

Hevbendiya Niştimanî ya Demokratîk a Sûriyê bi durişma "Pêşeng be tu jiyan î" panelek li bajarê Reqayê li dar xist.

Panel bi navê "Jin bihara civakê ye" bi beşdariya kesayetên siyasî, rewşenbîr, nûnerên saziyên sivîl û leşkerî û jinên bajarê Reqayê li navenda Çand û Hunerê ya Reqayê çêbû.

Piştî rêzgirtinê axaftina destpêkê ya panelê ji aliyê nivîskar û helbestvan Fewziya El-Mirî ve hat kirin. Fewziya bal kişand ser "Taybetmendiyên mêtiyê û wiha got: "Bingehê her tiştî mê ye. Roj mê ye, jiyan mê ye, stêrk mê ye û gelek zindiyên din hene ku vê taybetmendiyê hildigirin."

Fewziya bal kişand ser Roja Jinan ya Cîhanê, êşa ji destpêka gerdûnê ve kişandîn, rola wê di şaristaniyên mirovayiyê de, şoreşa wê ya ji bo bidestxistina mafên xwe heta roja ragihandina Roja Jinan a Cîhanê.

Di panelê de girêdayî rewşa jinan çar mijar hatin nîqaşkirin.

**1: DÎROKA ROJA JINAN A CÎHANÊ**

**2: DI ŞER DE ASTENGIYÊN LI PÊŞIYA JINAN DERDIKEVEIN**

**3: NÊRÎNA HEVBENDÎ YA LI JINAN DI ÇARESERIYA SIYASÎ DE**

**4: ISRARA JINÊ Û ISBATKIRINA HEBÛNA XWE**






## Kuştina jinan herî zêde di dema AKPê de çêbû.

Li Tirkiyê di dema desthilatdariya AKP`ê de şideta li ser jinan zêde bû. 15 hezar û 557 jin di dema desthilatdariya AKP`ê ji sala 2002`an hatin kuştin.

Rojnameya Birgûn a çepgir a Tirkiyê di raporeke xwe de diyar kir ku sala 2002`yan li Tirkiyê 66 jin hatine kuştin û ji dema desthilatdariya AKP`ê ve jimar pirtir bûye û sala 2019`an herî kêm 474 jin hatine kuştin.

Rojnameyê agahiyên xwe spartine rapora ji aliyê hiqûqnas Sezgîn Tanrikulu ve bi pêmana 8`ê Adarê hatî amadekirin. Li gorî raporê di her du mehên destpêkê yên 2020`an 49 jin hatine kuştin.

Li gorî raporên hikmûmeta Tirkiyê, jimara jinên bûyîn qurbanên şidetê ji sedî 50 zêde bûye ku sala 2015`an 145 hezar bû û sala 2018`an 220 hezar bû.

Malperên Tirkî di demên berê de diyar kiribûn ku di demên dawî de kuştina jinan bi awayekî berbiçav zêde bûye.

## Ji bo piştgiriya jinên malbatên xwe di şer de winda kirîn, komeleyek hat vekirin

Komîteya Jinan ya Meclisa Malbatên Şehîdan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo piştgiriya jinên malbatên xwe di şerê li dijî çeteyên DIAŞ`ê de winda kirîn, Komeleya Maya li bajarê Qamişlo vekir.

Di merasima vekirinê de, endama Meclisa Malbatên Şehîdan Wensa Şawîş ku axivî vekirina komeleyê li malbatên şehîdan pîroz kir û wiha got: "Komele ji bo piştgiriya jinên malbatên xwe di şerê li dijî çeteyên DAIŞ`ê û êrîşên dewleta Tirk a dagîrker de winda kirîn, hatiye vekirin."

Wensa di berdwama axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya vekirina Komeleya Maya û da zanîn ku hem madî hem manewî wê piştgiriyê bidin malbatên şehîdan. Herwiha wê komele pirsgirêkan jî çareser bike. Wensa diyar kir ku navendên wiha bi saya berdêlên welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina xakê û garantiya jiyaneke birûmet dayîn, tên vekirin.

Paşê komele ji aliyê diya şehîd Dijwar Şiwafa Mihemed ve hat vekirin. Şehîd Dijwar di şerê li dijî li çeteyên artêşa Tirk de şehîd bûbû.







# Hevdîtin nayê wateya ku tecrîd bi dawî bûye

Ezîz Elî anî ziman ku dewleta Tirk di aloziyeke mezin re derbas dibe û dema di pêvajoyeke wiha re derbas dibe, dihêle hevdîtin bi rêber Abdullah Ocalan re çêbe, ji ber ku baş dizane ku hêza çareseriyê li cem Ocalan e.



Hîn jî dewleta Tirk a dagiker tecrîdê li dijî rêber Abdullah Ocalan dide meşandin, ev jî tê wateya binpêkirina qanûnên mafên mirovan û mafên girtiyên siyasî, her wiha nahêle malbat û parêzer bi rêber Abdullah Ocalan re bicivin.
Der barê rewşa Ocalan de gumanên gel zêde bûn û li seranserê bajarên Kurdan pêkhateyên baweriya xwe bi felsefeya rêber Ocalan tînin, daketin qadan.
Piştî bûyera şewata li Îmraliyê û bertekên gelan, dewleta Tirk rê da malbatê ku serdana Îmraliyê bikin lê dîsa gel dibîne ku ev nayê wateya ku tecrîd hatiye şikandin.
Têkildarî geşedanên piştî bûyera şewata li girava Îmraliyê û hevdîtina bi rêber Abdullah Ocalan re ANHA'yê roportajek bi endamê Akademiya Civaka Demokratîk şaxê kantona Hesekê Ezîz Elî re çêkir.
Ezîz Elî diyar kir ku destpêkê cîhan duserî bû, parçeyek NATO ya ku Amerîka serkêşiya wê dikir û Warsova ya ku Yekitiya Sovyetê serkêşiya wê dikir û di encamê de Yekitiya Sovyetê hilweşiya û Amerîka li meydanê ma, jixwe armanca Amerîkayê serwerkirina cîhanê ye û avakirina împaratoriyeke mezin e.
Ezîz Elî got Amerîka da ku projeyên xwe mîsoger bike divê ji Rojhilata Navîn dest pê bike, ji ber ku ew der navenda cîhanê ye lê di encamê de Çîn ber bi sermayedariyê ve çû û Kuba hate dorpêçkirin, lewma rê nedan kesî û sosyalîzma zanistî hilweşandin û ji kesên nûnertiya sosyalîzmê dikir, tenê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ma ku ew jî rêber Abdullah Ocalan rêbertiya wê dike.

**ARMACA KOMPLOYÊ**
Elî anî ziman ku gelên bindest di li cîhanê çarenûs û hebûna xwe di fikrin rêber Abdullah Ocalan de dibînin û wiha domand: "Armanca Komploya Navdewletî tunekirina Rêbertî û qirkirina gelê Kurd e lê bi saya fikr û felsefeya rêber Abdullah Ocalan armanca kompoyê pêk nehat û çalakiyên bi armanca şikandina tecrîdê komplo têk bir, lê dîsa tecrîd berdewam e.
Ezîz Elî diyar kir ku armanca tecrîda li ser rêber Ocalan dûrxistina wî ji civakê ye, sala 2015`an gelek hevpeyman di navbera Ocalan û dewleta Tirk de hatin îmzekirin, lê rewşa Sûriyê bandor li van hevpeymanan kir û xwestin aloziya xwe bixin nava Sûriyê, lê ev ne tenê dewleta Tirk pê radibe, di heman demê de dewletên sermeyadar ên cîhanê jî destên xwe tê de heye.

**'ŞEWATA LI ÎMRALIYÊ PLANKIRÎ BÛ'**
Elî piştrast kir ku bi armanca şikandina tecrîdê gel tê dikoşe, bûyera şewata li girava Îmraliyê ne teseduf bû, ji ber ku dewleta Tirk a dagirker dixwest berteka rêber Abdullah Ocalan, rêxistin û ya gelê Kurd nas bike.
Ezîz Elî bal kişand ser ku dewleta Tirk di aloziyekê re derbas dibe, dema dikeve aloziyê hevdîtina bi rêber Ocalan re erê dike, ji ber ku baş dizane ku rêber Abdullah Ocalan hêza çareseriya aloziyan e, piştî bûyera şewata li girava Îmraliyê bertekên gel li cîhanê pêk ve nehatin sekinandin û ji encamên van çalakiyên 8'ê Adarê hiştin hevdîtin bi rêber Ocalan re çêbe.

**BANGA BERDEWAMKIRINA ÇALAKIYÊN LI DIJÎ TECRÎDÊ**
Ezîz Elî wiha li axaftina xwe zêde kir: "Rêbertî di hevdîtinê de îşaret bi guhdaneke baş ji bo saziyên ji civakê re tevger dikin û Rojava û Bakurê Kurdistanê ber bi demokratîkbûnê ve diçin, divê berxwedan, azadî û demokratîkbûn domdar berdewam be, li gel vê yekê rola Rêbertî di çapemeniya azad de hebû, ji ber ku çapemenî xwedan roleke mezin û girîng e. Hêviya rêber Ocalan ji gel ew e ku gel bi vîn û israreke mezin kar û xebatê bike, her wiha kesên bi çarenûsa civakê dilîzin hişyar kir û got her hal ew ê werin cezakirin."
Ezîz Elî di dawiya axaftina xwe de got: "Ez bang li gelê Kurd û gelên cîhanê dikim ku li dijî tecrîda li ser rêber Ocalan derkevin, ji ber hevdîtina bi Rêbertî re nayê wateya tecrîd bi dawî bûye."

## Nûnerên partiyên siyasî: Divê leşkerên Tirk werin derxistin

Nûnerên partiyên siyasî yên başûrê Kurdistanê diyar kirin ku armanca dewleta Tirk, tinekirina gelê Kurd e û banga derxistina leşkerên Tirk ji başûrê Kurdistanê kirin. Herwiha gotin, divê aliyên siyasî ji bo derxistina leşkerên Tirk bi hev re kar bikin.
Nerazîbûna li dijî dagîrkeriya dewleta Tirk ya li başûrê Kurdistanê dewam dike.
Endamên Tevgera Goran, Hizba Şuî ya Kurdistan û Yekîtiya Nîştimana Kurdistanê (YNK) li ser dagîrkeriya dewleta Tirk ya li başûrê Kurdistan û helwesta hizbên xwe ya li hemberî dagîrkeriyê, ji Rojnews re axivîn.
Endamê Tevgera Goran Haşim Salih bang li aliyên siyasî kir ku dijî destwerdana li başûrê Kurdistanê, dagîrkerî û derxistina leşkerên Tirk, bi hev re kar bikin û dawiyê li dagîrkeriyê bînin.
Berpirsê komîteya Şehîdên Yekîtiya Nîştimana Kurdistanê Mihemed Heme Salih jî diyar kir ku dewleta Tirk li dijî Kurdan tevan e û got, dewleta Tirk bê ku cudayiyê bixe nava Kurdan, hewldanên xwe yên ji bo tinekirinê didomîne. Wek YNK em li dijî hebûna her leşkerê li ser xaka Başûrê Kurdistanê ne."
Endamê komîteya Hizba Şuî ya Kurdistanê a Germiyanê Pêşrew Reşîd jî li ser heman mijarê nêrîna xwe par ve kir. Li gorî Pêşrew, dewleta Tirk ji lihevkirina sala 80'î ya dinavbera Iraq û Tirkiyeyê de sûdê digre, ji bo wê jî dagîrkeriya xwe didomîne.
Pêşrew da zanîn ku dagîrkeriya Tirk roj bi roj berfirehtir dibe û got; "Wek Hizba Şuî em her tim daxwaziya derxistina leşkerên Tirk û hêzên din yên dagîrker yên li ser xaka Iraqê û Kurdistan dikîn."
Pêşrew herî dawî bang li hêzên Başûrê Kurdistanê kir ku leşkerên Tirk ji xaka Başûrê Kurdistanê derxin.

## Stratejiya me avakirina Sûriyeyeke demokratîk û yekîtiya Kurdan e

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk Ehmed Xoce got, "Armanca me ya sereke pêkanîna yekîtiya Kurdan û avakirina Sûriyeyeke demokratîk û nenavendî ye."
FacebookTwitterWhatsAppTelegram
Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk Ehmed Xoce diyar kir ku partiya wan piştî lidarxistina kongreya xwe meha borî stratejiya xwe ya siyasî diyr kiriye.
Xoce wiha got: "Di pêvajoya bê de emê tekoşîna xwe li ser esasê çareserkirina aloziya Sûriyê pêş bixin. Li aliyê din armaca me ya bingehî wê pêşxistina yekîtiya Kurdan be."
Partiya Yekîtiya Demokratîk kongreya xwe ya 8`an 25 û 26`ê Sibatê lidar xist. Di kongreyê de hevserokatiya partiye, 90 endamên meclisê û 7 endamên komîteya displînê hatin hilbijartin.
Xoca di dewama axaftina xwe de wiha got: "Niha em li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di pêvajoyek nû de derbas bibin. Armanca me pêkanîna Sûriyeyeke demokratîk, nenavendî û parastina nimûneya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Herwiha em hewl didin diyalogê bi tevayiya partiyên siyasî re daynin.
Xoca diyar kir ku ji destpêka aloziya Sûriyê ve helwesta wan diyar bû û wiha axivî: "Ango riya sêyem. Me nedixwest rewş bigihîje şerekî leşkerî. Em bawer dikin ku diyalog çareseriya tekane ya vê aloziyê ye. Pirsgirêka Sûriyê wê bi riya diyaloga sûrî-sûrî bi dawî bibe, ne li derve. Ji bo wê em ji dilyalogê re vekirî ne û xebata me tev ji bo wê ye.
Xoce axaftina xwe wha domand: "Yekîtiya Kurdan armanca partiye ya sereke ye. Lewre divê di avakirina Sûriyeyeke demokratîk de mafên Kurdan misoger bibin û ev jî bi yekîtiyê dibe. Me hewl da û em hewl didin vê yekîtiyê çêkin. Bi riya avakirina Rêveberiya Xweser bi tevlîbûna gelek partiyên siyasî yên Kurd me ew tişt pêk anî. Di pêvajoya bê de ji me tê xwestin ku em ji bo avakirina helwesteke kurdî yekgirtî kar bikin. Da gelê Kurd bikare di Sûriyeyeke demokratîk de xwe bi rê ve bibe. Ev pêkhatina yekîtiya Kurdan ve girêdayî ye.



## Guleyên şerê taybet peyv in

Qasim ENGÎN

Tê gotin ku; "Guleyên Şerê Taybet Peyv in." Û çi hêzên hegemon û çi jî hêzên dagîrker ên serdest rastî jî dizanin çawa peyvan bi bandor li ser derûniya mirovan kar bînin.
Lê ne gengaz e ku her tim ew peyvên ku wek guleyan tên bikaranîn bi bandor bibin. Wek Lîncoln'ê Amerîkî jî dibêje: "Hûn dikarin hinek mirovan herdem, hinek mirovan dem deman, lê hûn nikarin her kesî hertim bixapînin."
Xepandin ango bandora peyvan li ser derûniya mirovan kengî û bi kîjan rê rêbazên qirêj bi bandor dibin?
Wek Rêber Apo jî îfade dike: "Şerê Taybet, di esas de di şert û mercên ku tewazina hêzan bi aleyhê hêzên serdest de dest bi xerabûyînê ve diçe, derdikeve holê." Rastî jî herî zêde derew, ango erîşên manîpulatîv di demên ku hêzên serdest tengav dibin û nema rastiya berovajî bikin dikevin meriyetê.
Lê pêwîst e ku were zanîn; hêzên serdest, dagîrker û hegemon herî zêde di kêliyên wiha de dest diavêjin nakokiyên ku mirov û civak di hundir de dijîn. Ji ber ku;"Cewherê şerê taybet, ew rêbaza serwertiyê ye ku civakekê ji ber naqokî û lewaziyên wê yên hundirin berbide hev û serweriyê xwe bidest bixe" bi xwe ye. Û em dizanin ku hêzên dagîrker çi di milê civaknasî de û çi jî di milê derûnasî de gelê me ango me baş dinasin. Di wê wateyê de eger heta niha karine me di bindestiyê de û di bin serweriya xwe de bigirin yek jî sedema xwe ew e ku lewazî û nakokiyên me jî baş dizanin. Ev zanîn ne ji bo xêrê Kurdan e, ev zanîn û naskirin berovajî ji bo ku bikarin me di rewşa koletiyê de bihêlin.
Eger mijar bibe civaka Kurd û Kurdistan, hêzên dagîrker ji tevahî ezmûnên ku dijî gelan di milê hêzên serdest û hegemonan ve hatine meşandine hewl didin ji van jî sûdê bigirin. Û girtine jî!
Armanç ew e ku civaka me bikin perçeyek i dewleta xwe. Dewletê ango serdestî û koletiyê li ser me ferz bikin, da ku bikaribin bi rehetî bemeşînin.
Ev jî; bêguman bi hedef û armanca ku civakê bikin dewlet, ango dewletê li ser giştî civakê ferz û hakîm bikin bi rê ve dibin.
Bi gotinek din: "Bi şerê taybet dewlet, dibe takekes û civak." Lê dema ku civak û takekes ji rastiya xwe dûr ket û bû dewlet, ji mirovbûnê derdikeve. Ji ber ku dewlet tenê koletî û serî tewandinê dipêjirîne. Bi vê civak ji civakbûnê û mirov jî ji mirov bûyîne dikeve. Ya ku dimîne jî, tenê dewlet dimîne.
Pêwîste ku were zanîn: "Şerê taybet, şêweyekî şerê ku li hemberî vînên dixwazin azad bimînin tê ji derxistine. Ev jî bêguman; bi terorîzekirin, qetilkirin û tepisandinê tê pêşxistine û hatiye pêşxistine.
Vê çawa dikin? Li kêleka wek fizîkî tinekirina aliyê dijminan ve, lê ji vê hêna bêhtir û bi bandorker li ser hiş, hest û tercîhan hikumkirina li ser vîna mirovan de tê pêşxistin. Armanca vê jî bêguman, girtina bin venêrînê, manîpile û arastekirin e.
Bi heviya ku em dema, -dem û rojên Newrozê dijîn,- rê nedin nakokiyên navxweyî.



# Serhildana Qamişlo, Çirûska destpêkê ya Bihara Gelan e

Tevî girtin û zordariya rejima Sûriyê, 2004an bi sedhezaran Kurd ji bajarê Qmişlo heta paytexta Sûriyê Şamê rabûn serhildanê. Ew serhildan bû çirûska yekê ya bihara gelan û bingehê destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê-Bakurê Sûriyê.

12`ê Adara 2004`an şêniyên bajarê Qamişlo û heskiriyên futbolê, li yarîgeha Belediyê li benda maça futbolê bûn. Ya di navbera tîma Cîhad û tîma Fitiwa ya ji Dêrezorê de. Ku di çarçoveya lîga futbolê ya Sûriyê ya werza 2003/2004 dihat li darxistin.

**LI YARÎGEHÊ..ÇIRÛSKA SERHILDANA KURDÎ**
Berî destpêkirina maçê, alîgirên tîma Fitiwe ya ji Dêrezorê durişmên li dijî Kurdan avêtin. Ji nişka ve alîgirên tîma Fitiwe bi kevir û çekên spî êrîşî alîgirên tîma Cîhad kirin. Piştî ku gelek kes ji alîgirên tîma Cîhad birîndar bûn, li nava yarîgehê di navbera her du aliyan de şer derket. Pişt re jî hêzên rejimê gule li sîvîlan reşandin. Di encamê de 3 ciwanên Kurd jiyana xwe ji dest dan û bi dehan jî birîndar bûn.
Piştî agahiyên kuştina ciwanên Kurd, welatiyan dikanên xwe girtin û daketin qadan û xwepêşandan li sernaserê bajêr belav bûn. Roja duduyan li bajêr greveke giştî hat destpêkirin û bi dehhezaran beşdarî merasima cenazeyên her sê ciwanên Kurd bûn. Hêzên rejimê careke din gule li gel reşandin. Jin û zarok jî di navê de bi dehan sivîl şehîd û birîndar bûn.
Tevgera Civaka Demokraîk sala 2017 ragihand ku di dema serhildana 2004an de û li girtîgehan bi işkenceye jimara Kurdên bûyîn qurban gihîştiye 40î

**SERHILDAN BINGEHÊ BIHARA GELAN E**
Serhildana gelê Kurd li seranserê bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya sala 2004`an, bû pîvana asta birêxistinbûna gel û girêdana bi armanc û mafan ve. Piştî 6 salan, gelên herêmê li dijî hikumetê xwe rabûn




ser piyan. Gelan ji Tunis, Misir, Lîbya û Yemenê dest bi serhildanê kir û sîstemên dîktator ji desthilatdariyê xistin. 15`ê Adara 2011`an jî gelê Sûriyê daket qadan û heman daxwaziya xwepêşandêrên Qamişlo ya sala 2004`an "azadî", xwestin.
Serhildana 2004`an bû bingehê şoreşa Rojava ya 19`ê Tîrmehê. Daxwaziya azadî, demokrasî û edaletê ku di 7 rojên serhildanê de bi hezaran welatiyan dianîn ziman, bi şoreşa 19`ê Tîrmeha 2012`an ku ji Kobanê dest pê kir nehatin guhertin.

**DI 16 SALAN DE, HEVGIRTINA GELAN PLANÊN BAASÊ TÊK BIRIN**
Piştî serhildana Qamişlo 16 salan şoreşa li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Kurd, Ereb, Turkmen, Aşûr, Suryan, Keldan û Çerkes himbêz kirin. Di salên şoreşê de, ev gel beşdarî Rêveberiya Xweser ya Demokratîk û Hêzên Sûriye Demokratîk bûn û li djiî terorê yek ref ava kirin. Her wiha bi hevgirtineke neteweyî parastina welatê xwe kirin.

## Erdogan ji Rûsyayê destvala vegeriya

Dawiya sala borî û destpêka vê salê, gelek bûyerên girîng li Sûriyê qewimîn. Ji aliyekî ve Trump vekişandina hêzên Emerîkayê ji bakurê Sûriyê ragihand. Wê jî rê ji Tirkiyê re vekir ku bajarê Serêkaniyê û Girê Spî dagîr bike. Ji aliyekî din ve Rûsya û Tirkiyê li bajarê Idlibê li hemberî hev sekinîn.
Girêdayî mijarê lêkolînerê American Project Institute for Public Policy Research (AEI) û berpirsê berê yê Pentagonê Michael Rubin girêdayî stratejiya Emerîka ya li Sûriyê ji ANHA re wiha axivî: "Trump dixwaze Emerîka ji Sûrî derkeve. Lê gelek kesên Emerîkî yên xwedîbiyar di nav de mezintirîn şêwirmendên wî dikevin ferqa girîngiya stratejîk a mayîna li herêmê. Kesên siyaseta Emerîka bi rê ve dibin ji mayîna li Sûriyê dixwazin rê li pêşiya Îranê bigirin da ber bi rojhilatê Deryaya Spî ve belav nebe."

**SÎYASETA DERVE Û ÎSTÎXBARATÊ HEMÛ DÎZANÎN**
Rubin, dewama axaftina xwe de wiha got. "Ji bilî Trump û nûner James Jeffrey, pisporên siyaseta derve û istixbaratê hemû dizanin ku Tirkiye desteka DAIŞ`ê dike û Tirkiye girîngiyê nade têkoşîna li dijî rêxistina El-Qaîdeyê. Piştî axaftina di navbera Erdogan û Trump de û vekişîna ji nişkan ve ya hêzên Emerîkayê, generalê malnişîn Jack Kane Trump îqna kir ku qadên petrolê yên Sûriyê biparêze da vekişîna ji Sûriyê rawestîne. Ev ne sedemeke berbiaqil e. Bi taybetî dema em li sedemên stratejîk û exlaqî yên mayîna DYA`yê li Sûriyê binêrin. Lê ew ew egera sereke bû ku Trump îqna bibe ku li Sûriyê bimîne.

Li ser lihevhatina Rûsya û Tirkiyê jî Michael Rubin wiha axivî: "Rûsyayê xiyanet li Tirkiyê kir. Her tim Erdogan xwe di radeya Putin de didît. Lê Putin vê carê Erdogan weke xizmetkarekî zelîl dît.



Putin, Erdogan neçar kir ku biçe Moskovayê. Rêbaza ku hişt Erdogan li derveyî hola civînê li bendê bimîne, bi kar anî. Erdogan destvala ji Moskovayê vegeriya. Ew tiştek gelek şerm e.
Di rastiyê de Rûsya û rejîma Sûriyê di hundirê Sûriyê de bûn hêzeke sereke. Tirkiye dikare li axa Sûriyê bi erêkirina Putin tene kar bike."

## Şêwirmendê Xumineyî Welayetî bi vîrûsê ket

Şêwirmendê siyasî yê navneteweyî yê lîderê olî yê Îranê Elî Xamineyî, Elî Ekber Welayetî bi vîrûsa COVÎT-19 ketiye.

Balkêşe kesên li îran bi vîrûsê dikevin hemû rêvebir û berpirsiyarin. Gelek parlemneter û eksên nêzî Xumeynî bi koronayê ketin û her wiha tê gotin hejmara kesên pê ketine ji daneyên fermî zêdetire.
Çavkaniyên mûxalîfa Îranê yek ji kesên siyasetmedarên Îranê Elî Ekber Welayetî bi vîrûsa Koronayê ketiye.
Hate ragihandin ku Welayetî xistine karantînayê û peywendiyên wî bi gelek kesan re jî pêk hatiye.
Di hefteyên dawî de li Îranê gelek siyasetmedar û endamên hikûmetê bi vîrûsê ketine. Li gorî agahiyên fermî li Îranê 10 hezar û 75 kes bi vîrûsê ketine, 429 kes jî mirine.
Lê li gorî çavkaniyên mûxalîf, vîrûs belavî 149 bajaran bûye û hejmara miriyan jî 3 hezar û 300 kes in. Tê îdîakirin ku tenê li bajarê Kum 520, li Tehran 500 kes mirine.



FENER



## Aqil Li Seriyan E Yan Li Dirêjahiya Çongan E?

Idrîs HENAN

Ji dêrîn de gotine ku; gotinên pêşiyan, wek neqşa li ser keviran e. Lê diyare serdestên demê hîna jî dixwazin ava ku ji çiyayan diherike û li newalan belav dibe, berovajî bikin û ji newalan ber bi çiyayan ve biherikînin?. Her tiştî li gorî mentelîteya xwe ya ku pala xwe daye dizîn û talaniya nirxan diguherînin û li gorî xwe jî "rastiyên rojane" diafirînin!.
Rejîma dîktator a Baas tevî ku li tayekê maye textê xwe ji dest bide, hîna jî nikare xwe ji lîzka modernîteyê rizgar bike û di kirinên xwe yên beriya 2011'an de bi israr e. Çep rast lêdixe û daxuyaniyên ne li gorî kapasîteya xwe dide. Mîna qijikan serî li aliyekî û beden li aliyekî ye, hîna jî behsa çizeçize qewirandinê dike! Jibîr kiriye ku; 'ji serê qijikan qelî çênabe'. Ne jî dixwaze bîne bîra xwe ku; 'Gayê qelb, barê giran hilnade'. Bi gotineke din, di nav de maye û êdî serê xwe ji lingê xwe dernaxîne.
Di demekê de ku cinawerên serdemê bi laşê peydakerên xwe ketine, nola kesê ku 'serê xwe şuştiye û eniyê xwe hilmaştiye, diçe nav dijmin qey aştî ye' lê hatiye. Li her dera Sûriyê serweriyek hatiye ferzkirin. Li ser her bostek axa Sûriyê hegemoniyek heye. Ji tebayên di bin navê ewlekariyê de bigire û heya qertelên modernîteyê were, hemû fena qirradan xwîna vê axê dimêjin, hîna jî serokrejîm li ber mirazê xwe yê domandina pergala herifî ye?! Eceba kesek xwedî vîn be, dikare her rojekê û saetekê daxuyaniyên cuda cuda bide? Mîna kesê got û nekir, nemêr e.
Ji xwe yek ji xisletên van sîstemên han ku; xwediyê meqesê ne. Dinoqin avê û tiliyên wan li banî ne. Ji kirêtî û faşîzma xwe nakevin. Pergala desthilatdar a Baas li Sûriyê veguheriye goka di nav lingên berjewendî û keyisbaziya hegemoniya navendê de, lê dîsa jî ders negirtiye û xwe li ber bayê qertel û dirindeyên wek Rûsya û Îranê xistiye. Li dijî îradeya navendê ya guherîna rûyê sîstemê neh salin têdikoşe, lê di heman demê de hewl dide rûyê nijadperest ê netewperestiya xwe di nav basikên heman navendê de biparêze. Ji lew re berê xwe dide îradeya ku bi saya têkoşîna demokratîk a bi bedelên gelan hatiye avakirin û dixwaze hemû binkeftinên xwe lê bar bike. Qey mirov dibêje; sedema têkçûnê pêkhateyên Sûriyê ne qirêjiya sîstema bi xwe ye?
Bi qasî aliyên ku li Sûriyê di pêşbirka ferzkirina hêzê de ne, bi qasî kûrbûna qeyranê û skendalbûna kirîza rojhilata navîn, sîstemên neteweperest di nav hewldanên muhafezekariyê de ne. Ji nû ve hewl didin gelan bixin qurbana berjewendiya desthilatdariya 'pîroz' a ku qaşo xwedayan li ser navê wan mohr kirine û mandebûna xwe misoger bikin. Ji ber vê jî sîstemên faşîst ên fena Baas, AKP û MHP gelek bi hêsanî dikarin gel û axa welatên xwe bixin mijarên bazarê.
Li Sûriyê tu dever nema ji aliyê vê sîstemê ve nehat firotin. Ji peravên Tartûs û Laziqiyê bigire û heya Serê Kaniyê, Girê Spî, xeta Cerablus-Bab, Efrîn û Idlibê were, hemû jî bi tiliya rejîma desthilatdar a Baasê hatine kirîn û firotin. Hîna jî maf daye xwe ku nasnameya hemwelatiyê li gelên resen belav bike?! Eceba aqil li seriyan e yan li dirêjahiya çongan e? Kîjan rejîma ku rewatiya wê cihê guman û lêpirsînê be, dikare bi derziyê biçe ser şûjinê û dapiyên gelan derxîne û bibêje ku ev resen an ne resen e?.